



## Mafên wekhev ji bo jin û mêran li Almanyayê

### Mafên wekhev ji bo kesên bi elaqe û nasnameya cinsî ya cuda li Almanyayê

Cihêkarî û tundiya ser esasa regez, rengê çermî, ol an nasnameya nijadî li Almanyayê qedexe ye û kesê/a sûcdar dikeve ber cezayê. Dema kesek bi sedemên regez, rengê çermî, ol an nasnameya nijadî li nav an li derveyî malê wekî mînak rêveberîyan û an di dema kirrînê da rastî cihêkarîyê tê an hest bi metirsîyê dike, tê pêşniyarkirin ku digel yek ji karmendên navendê an digel polîs pêwendîyê bigire (hejmara telefonê : 110), an seredana navenda şêwirmendiyê (Agahiyên peywendîgirtinê li jêrî rûpelê bibîne) bibe. Tevahîya cûreyên şidetê wekî, bêrûmetî, zexta cinsî an gefa şidetê li dijî mirovên din li Almanyayê qedexe ne û wekî sûc tên hesabandin.

Jin û mêr xwedî mafên wekhev in. Destdirêjîya li ser mafên kesên din, çî mêr be çî jin, qedexe ye. Dema kesekî hez dike ku bi tenê be divê rêz ji wê daxwaza wî/ê bê girtin. kiryarên cinsî li dijî daxwaza kesekî qedexe ye û wekî sûc tê hesabandin.

Kesên homoseksûel û kesên ducinsî heman mafên kesên din hene. Jîyana hevpar a homoseksûelan li Almanyayê bi fermî û qanûnî hatiye naskirin û dikare bi awayekî fermî pêk bê. Mixabin hertim hinek kes hene ku kesên din ji ber taybetiyên cinsî yên ciyawaz dixin ber cihêkarîyê. Dijminatîya ligel homoseksûelan li civakê nayê qebûlkin. Ketina ber şopandinê bi sedema cihêtiya cinsî, li welatê xwe, wek nimûne qedexekirina homoseksûelîtiyê dikare bibe sedema egera daxwaza penabertiya li Almanyayê.

### Navenda şêwirmendî û Zanyariyên Tekmîlî

Telefona alîkarîya «Tundiya li dijî jinan» li Rêveberîya Federal a Malbatan û Mafên sîvil (medenî) bi awayê şevûrojî û bi awayê nenasî bi reqema 0800 116 016 û şêwirmendiya Online di malpera [www.hilfetelefon.de](http://www.hilfetelefon.de) de li ber destan e; Wergêrên bi 15 zimanan li ber dest in. Babetên wisa bi telefona alîkarîya «Jinên pêgiran ku pêdiviya wan bi alîkarîyê heye» bi telefona 0800 40 40 020 û li serxetê li [www.schwanger-und-viele-fragen.de](http://www.schwanger-und-viele-fragen.de) de hene.

Ev qanûn herwisa kesên ducinsî jî digire ber xwe. Baştir e berî raberkirina daxwaza penabertiye hemî şert û mercên baş bizanin. Navenda Şêwirmendîya Homoseksûel û Kesên Ducinsî rolek girîng li Almanyayê heye (Agahiyên peywendîgirtinê li jêrî rûpelê bibîne)

Mafên berçavgirtî li Qanûna Bingehîn misoger dikin ku her kesek li Almanyayê bikare hevjinê/a xwe bi serbestî û bi dilê xwe bibijêre û biryarê bide ka dixwaze digel kesekî/ê bizewice an bi wî/ê re bijî. Gelek jin û mêr bêyî ku bizewicin bi hev re dijîn. Hinek dixwazin bi tena serê xwe bijî. Nezewacîn tam wekî zewacê normal e. Her wisa hevjin dikarin biryarê bidin ku nebin xwediyê zarokan.

Diyarkirina evîna xwe ji aliyê jin û mêran li Almanyayê ne-asayî nîne. Ev babet dikare girtina destê hev, hembêzkin û ramûsandin be. Ev kara ewqas normal e ku kesek bala xwe nade ser. Jin û mêrên homoseksûel wekî kesên din heman maf hene û ew jî dikarin hezkirina xwe di civakê de diyar bikin.

Karmendên Navenda Şêwirmendîyê li bara bersivandina pirsên li ser babetên jor li ber dest in. Em ti cûre cihêkarî û şidetê qebûl nakin. Hûn dikarin her demekê ji ber bûyerên nerênî an gefan seredana me bikin. Karmend berpirs in ku sîrr û nepeniyên seredaneran biparêzin û divê ku ew rêzê li qada xusûsî ya mişterî û seredaneran bigirin.

Hûn Navenda şêwirdariya homoseksûel û ducaniyan jî dikarin di broşûra «Şêwirdarî û alîkarîya ji bo penaxwazan a LSBTTI\*» li malpera [www.queer-refugees.de](http://www.queer-refugees.de) de peyda bikin û vê daxînin.

Agahiyên zêdetir li van malperan bi zimanên cuda, li ber dest in:

[www.refugeeguide.de](http://www.refugeeguide.de)  
[www.queer-refugees.de](http://www.queer-refugees.de)

